

# Guneh û qurban

Bona ku em qurbanbûna Îsa Mesîh fam bikin pêşiyê divê em binêrin ka guneh çiye û Xwedê çawa li gunehê dinêre.

Ger em gunehê mîna têkiliya di navbera Xwedê û mirov de û di bin dorbenda zagona Wî ya exlaqê de terîf bikin; di lêkerê û di ramana paşî lêkerê de li gora zagona Xwedê ya exlaqî nekirin e. Kitêba Pîroz dibêje: Guneh **“Zagon nenasî”** ye (1.Yû.3:4).

Dema Xwedê, di Kitêba Pîroz de daxuyaniya xwe dike; pîrozbûna xwe dibêje. Di 1.Pêtrûs 1:15’an de **“Pîroz bin! Ji ber ku ez pîroz im”** dibêje. Di nava têgîna pîroziyê de guneh û xerabî nîne. Xwedayê Pîroz yê ku di Wî de guneh nîne, ji gunehê dikerihe, lê belê ji ber hezkirin û dilovaniya xwe, ji mirovên ku tobe dikin ve dilxweş dibe.

Mîna ayeta ku me niha xwendin, Xwedê dixwaze ku mirov ji rêyên xweyî xerab vegerin û gunehê nekin. Bona ku bizanibin, hemî gunehên mirov bi zanîn an jî nezaniyê dikin çi qas kerax in û li dijî vê keraxiya wan Ew çi qas keremkar e, pergala qurbaniyê aniye. Vêya ji Adem û Hewa ya ku guneha pêşîn kirine ve xistiye meriyetê. Di Kitêba Afirandinê, beşa 3, ayeta 21’an de em têdighên ku Xwedê ji ber vê guneha ku hatiye kirin qurbanekê serjêkiriye: **“XUDAN Xwedê, bona Adem û jina wî ji çermê kincan çêkirin û li wan kirin.”**

Wekî wê, Xwedê, bona baweriya Birahîm Peyxamber biceribîne, ji wî xwestibû ku bila lawê xwe di pêşkêşîgehê de qurban bike. Birahîm sedema daxwaziya Xwedayê Dilovan bitûmî fam nekiribû, lê binêrin çi gotiye: **"Birahîm, Lawê min, dê Xwedê bi xwe bona pêşkêşiya şewitandinê berxê peyda bike!"** 1.Mûsa 22:8).

Dema em Kitêba Pîroz dixwînin, em gellekî qenc fam dikin ku Xwedê çawa bi cidîbûnê li gunehê û serjêkirina qurbanê dinêre. Di Nameya Romiyan 6:23'yan de, em dibînin ku berdêla gunehê hatiye kirin mirin e. Mirov çi qas bi dirêjî bijî bila bijî, muhaqeq rojekê dimire. Ev aqûbeta ku jê filitîn nîne ji me re di Romiyan 5:12'an de wisa hatiye daxuyanî kirin: **"Guneh bi navgîniya mirovekî, mirin jî bi navgîniya gunehê kete dinê. Bi vî awayî mirin bi hemiya mirovan ve belav bû. Ji ber ku hemûyan jî guneh kirin."** Mîna ku di ayetê de dibêje, me hemûyan guneh kirin û em ê rojekê ji ber gunehê xwe bimirin.

**Belê! Lê çareseriyek qet nîne?**

Di Kitêba Îbraniyan beşa 9'an Ayeta 22'an de, Zagona Xwedê gellekî aşkere ye: **"Çawa ku li gor Zagona Pîroz hema her tişt bi xwînê ve têne pak kirin, bêyî xwînrijandinê bexşandin nabe."** Dema di heman

Kitêbê de beşa 10’emin, ayetên 4-7’an bixwînin, em dê bibînin, vaye nîşan dide ku, em yên gunehkar, bi serjêkirina qurbanê nikarin ji gunehên xwe ve xelas bibin: **“Ji ber ku xwîna ga û nêriyan gunehan ji holê ranakin. Ji ber vê yekê dema Mesîh hate dinê wisa dibêje: Te qurban û pêşkêşî nexwestin. Lê belê te bona min bedenekê amade kir. Tu ji pêşkêşiya şewitandinê û pêşkêşiya gunehê dilxweş nebû.”**

Belê, lê gelo em bona kesekî din xwe mîna qurban pêşkêş bikin dibe? Bila Kitêba Pîroz bersiva vê pirsê bide me: **“Tu kes nikare berdêla jiyana tu kesî bide, nikare fidyê bide Xwedê. Ji ber ku fidya jiyanê mezin e, divê tu kes bona dayîna wê hewl nede. Ger ne wisa be, dê heta bêdawîbûnê bijî mirov, qet gorê nabîne.”** (Zebûr 49:7-9).

Wisa tê ku, rûmeta kêferata me, ya ku bona yekî em gellekî hez jê dikin, li ber çavên Xwedê qet nîne. Bi tahb û rêbazên xwe, di dayîna berdêla gunehan de em gellekî neehlî ne.

Di Kitêba Pîroz de 2.Mûsa, beşa 21. de rêgezekî Xwedanî nivîsandiye. Xwedê li wê dibêje ku: **“Dê di berdêla canê de can, di berdêla çav de çav bête dayîn.”** Xwedê di hemî rewşan de vê rêgezê ji bo dadiya xwe bikar tîne. Di mijara xelasiyê de jî heman

rêgez derbasdar e. Mirovek mîna Ademê beriya gunehê, yanê mirovek bêguneh dikare di berdêla gunehên me de kêferatê bide. Çawa ku ji Adem heta roja me yekî jiyaye nîne, vê rewşê bi aşkereyî daxuyan dike. Jixwe Mîna ku me niha xwendin, her kes guneh kirin û mirina ku berdêla gunehê ye tam kirin. Ev rêgez, xelasiyê tîne rewşeke çi qas bêderfet ne wisa?

Xwedê mîna mafên afirandin û tolhildanê, mafê xelaskirinê jî ji xwe re dihêle. Şukir be ku, Xwedê wê rêya xelasiyê ya ku em gunehkar nikarin tê de serfiraz bin, bi xwe pêk anî! Kitêba Pîroz gellek caran mizgîniyê dide ku dê xelasî tenê ji XUDAN ve bê: **“Xwedayê me Xwedayek Xelasker e, ji mirinê ve xelaskirin tenê xisûsiyeta XUDANê Serwer e.”** (Zebûr 68:20).

Wê gavê, gelo Xwedê çima bona kêferata gunehê pergala serjêkirina qurbanê anî? Wekî em dibînin qurban serjêkirin hêrsa Xwedê ya li dijî gunehê aş nake. Xwedê, pergala serjêkirina qurbanê bona, guneh bi xwînê ve tête paqij kirin, guneh çi qasî daraziyek tirsehêz tîne, yanê tunebûnê, mirinê tîne bigehîne mirovahiyê û mirov, hebûna nûçeya qenciyê fam bikin aniye. Hemiyên vana qurbaniya ku dê Îsa di xaçê de pêşkêş bike nîşan didan.

Wê gavê, divê bona guneh ji holê rabe him xelasî ji Xwedê ve bê û him jî mirovek bêguneh, yê mîna rewşa Adem ya berî gunehê, gunehê û encamên gunehê ji holê rakin. Yanê divê him bitûmî Xwedê him jî bitûmî mirovek bêguneh be: **“Lê belê wexta dem tijî bû, bona ku yên di bin zagonê de xelas bike, Xwedê, Mesîhê xwe yê ku ji pîrekê ve bûyiye, yê ku di bin zagonê de bûyiye şand.”**

Guneh bi navgîniya mirovek, yanê Adem ve bi hemiya mirovan ve belav bûbû. Îsa bona encamên wê û gunehê, ya ku ji nifşe derbasî nifşeyan dibe ji holê rake û hêrsa Xwedê li dijî gunehê ji holê rake, mîna ku di Kitêba Pîroz, di beşa Fîlîpiyan, 2:6-8’an de hatiye nivîsandin, bû mirov. Ez dixwazim vêya ji cih ve bixwînim: **“Mesîhê ku, çawa di haweya Xwedê de bû jî, lê bi Xwedê re wekheviyê mîna xenîmetekê nehesiband; lê belê ji bilindahiya xwe tazî bû û haweya qûla girt û di mînakbûna mirovan de bû; û di awayiyê de wekî mirov hate dîtin û heta mirinê, belê heta mirina xaçê îtaet kir û xwe nizm kir.”**

Ji ber vê yekê Îsa Mesîh, bi tûmî mirov û bi tûmî Xwedê bûnê li ser rûyê erdê jiya û li ser xaçê, bona gunehên me mir. Bona ku Îsa di vêya de serfiraz be, divê jiyanek bêguneh bijiya. Birastî jî Îsa, tu carî gunehê nekiriye. Em dikarin vê rastiyê di 1.Pêtrus 2:22’an de bibinîn:

**“Wî guneh nekir, ji devê Wî gotina bi fen derneket.”** Xwedayê Pîroz jî, kêferata Îsa ya li dijî gunehê qebûl kir. Ji ber vê yekê, em bawermendên Mesîh, ji ber ku Îsa Mesîh li ser xaçê kêferata gunehên me dane, qurbanê serjê nakin. Kêferata Îsa qandî ku hemî gunehên di raborînê de, di dema niha de û di dema hatinê de ji holê rake birûmet e.

Belê, Xwedê xelasiyê pêk anî. Vêya bona me, mirovên ku afirandine peyde kir. Kitêba Pîroz dibêje ku: **“Ji ber, Xwedê ew qasî ji dinê hez kir ku, Mesîhê Xweyî tekane da. Wisa ku, tu yên baweriyê bi Wî bînin helaq nebin, lê hemî bigihêjin jiyana bêdawîn.”**

Em dikarin bi bawerî anîna Îsa bona gunehên me li ser darexaçê ve miriye, xelas bibin. **“Hûn bi rêya baweriyê, bi xêrê ve xelas bûn! Ev ne serfiraziya we, lê diyariya Xwedê ye. Bona ku kes pesnê xwe nede, ne xelata karên qenc e.”** Belê, di vê ayeta Efesiyan 2:8’an ya ku me xwend de mîna ku em dibînin; xelasî, diyariyek Xwedê bona me gunehkaran peyde kiriye yî. Xwedê jî li bendê ye ku em bersiva vê peyda kirina Wî, li gor ayeta di Romiyan 10:9’an de bidinê: **“Ji ber ku ger tu bi devê xwe bi eşkeretî bibêjî Îsa Xelasker e û ji dilê xwe baweriyê bînî ku Xwedê wî ji mirinê vejandiye, tuyê xelas bibî.”**

A vay, reçeta ku pêdiviya hemî mirovahiyê ye! Em ji vêya re dibêjin nûçeya qenc: Xwedê, bi navgîniya Îsa Mesîh ve xelasiyê anî.

Wê gavê em li hember vê rêya xelasiyê ya nûwaze ve bêpêwendî nesekinin. Ya na, em ê nikaribin ji cezê birevin. Ger hûn bixwazin, hûn dikarin bi vî awayî dua bikin û tobe bikin: **Ya Xwedayê min, ez mirovekî gunehkar im û xwe disipêrim te; ji kerema xwe ve li min bibexşîne! Ji ber ku Xelaskerê min Îsa Mesîh, bona ku min xelas bike, xwe bi qurbanî pêşkêş kir û ez baweriyê bi Wî tînim. Bona ku te li min bexşandiye spasiyên xwe pêşkêşî te dikim. Amîn.**

Xwendevanên hêja, ger pirsên we hebin, bi kerema xwe ji me re binivîsin. Em ê bona bersivdana pirsên we bi dilxweşî bixebitin.

**Navnîşana me ev e:**
Hoffnung und Leben e.V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld/Germany

Kurdisch (Sünde und Opfer)